



**COVID-19 BOOSTER**

**LET'S DO THIS** – Kurdish Kurmanji



## **Kesên 16 salî û mezintir têne pêşniyar kirin ku di zûtirîn dem de Vaksîna bihêzkerina COVID-19 (booster) bistînin**

### **Çima booster pêwîste?**

Her çend we berê COVID-19 hebûbe jî, lêkolînan destnîşan dikin ku berevaniya we bi demê re dest pê dike ku kêm bibe.

Dozek bihêzker tîne bîra pergala xweya berevaniyê ku çawa vîrusê bibîne û şer bike. Hêzker parastina we li hember nexweşiyên giran ji COVID-19 heya 95% zêde dike.

### **Kî dikare vaksîna zêdeker (booster) bistîne?**

Kesên 16 salî û mezintir dikarin 3 meh piştî doza xwe ya duyemîn a vaksîna COVID-19 bistînin.

Tewra mirovên ciwan û saxlem jî divê vaksîna (booster) bistînin. Di zivistanê de, metirsiya girtina vîrusê zêde dibe, ji ber vê yekê vaksîna (booster) gavek hêsan e ku hûn dikarin bavêjin da ku xwe û yên li dora xwe ewle bikin.

### **Ger ku min berê COVID-19 hebûya pêdivîya min bi vaksîna (booster) heye?**

**Erê.** Parastina xwezayî ya her kesî li hember kulbûna pêşerojê cûda ye. Booster dikarin parastina we heya 95% li hember nexweşiyên giran xurt biket.

Piştî ku hûn bi tevahî ji vîrusê xelas bûn, hûn dikarin vaksîna (booster) bistînin. Ji bo pir kesan ev dora 4 û 6 hefte piştî kulbûna ye.

### **Kîjan vaksîn ji bo (booster) berdest in?**

Vaksînên Pfizer û Moderna mRNA ji bo mirovên 18 salî û mezintir wekî dozek (booster) têne pêşniyar kirin, tevî ku we ji bo du dozên xwe yên pêşîn derziyek din hebe. Vaksîna Pfizer ji bo mirovên 16 - 17 salî (booster) a pejirandî ye.

Vaksîna AstraZeneca dikare were bikar anîn dema ku derziyek mRNA ji hêla bijîşkî ve berevajîkirî be, an jî kesek vaksîn bi derziya mRNA red bike. Derziya Novavax dikare were bikar anîn heke derziyek din guncaw a COVID-19 ji bo wî mirovî neyê dîtin.

## Ma ez ê tûşî bandorên aliyê ji boosterê bibim?

Dema ku hûn doza booster digirin, dibe ku hûn tûşî bandorên aliyê yê hevpar û sivik bibin, mîna yê piştî du dozên yekem. Ew dikarin weku êşa milê, tayê, êşa masûlkan an hest bi mandîbûnê bin. Heke hûn bi fikar in, bi doktorê xwe re sohbet bikin.

## Çima mirovên di bin 16 saliyê de ne mafdar in ji bo boosterê?

Dozên Booster niha ji bo mirovên di bin 16 salî de nayê pêşniyar kirin. Di vê koma temenî de, nexweşiya ciddî ya ji COVID-19 ne giştî ye, û du dozên yekem bersivê berevaniyê ya bihêz çêdike.

## Di dema ducaniyê de girtina vaksîna booster silamet e?

Dozek booster silamet e û ji bo jinên ducanî yê ku 2 dozên derziya COVID-19 wergirtine, tê pêşniyar kirin.

Bi vaksînbûnê hûn zarokê xwe jî diparêzin. Delîl hene ku parastina ku hûn ji vaksînê distînin ji zaroyê we re jî derbas dibe.

Delîlên berferêh destnîşan dikin ku vaksînên COVID-19 silametin heke hûn ducanî bin, şîr didin an jî ji bo zaro hewl didin. Ew bandorê li zayîna we nakin.

## Ma madeyên nav vaksînê ji bo min guncaw in?

Hemî madeyên ku di vaksînên COVID-19 de tene bikar anîn li ser **Australian Register of Therapeutic Goods (Tomara Australya ya Berhemên Dermankirî)** tene navnîş kirin.

### Tu vaksînên COVID-19 li Austuralya nehat pejirandin ku:

- > hêk an hilberên heywanan hene
- > vîrusek zindî ya ku dibe sedema COVID-19 dihewîne
- > dikare bi her awayê bandor bike an bi DNAYA we re têkilî daynin
- > her tiştê ku dikare we bişopîne dihewîne
- > ji bo kesên ji hin ol û baweriyên ne guncaw in.

Ger hûn wekî beşek ji pîrozbahiyên cejna rojîyê digirin, bi ewle ye ku hûn derziya COVID-19 û booster bistînin. Vaksînên COVID-19 rojîya we naşînin ji ber ku nahêlin tiştêk têkeve zikê we.

Vaksînên COVID-19 DNA-ya we naguhezînin an gînen we naguherînin. Vaksînan laşê we fêr dike ka çawa xwe li hember COVID-19 biparêze û di nav çend rojan de tene hilberandin. Ew bi tu awayê bandor nakin an bi DNAYA we re têkilî nakin.

## Ma vaksînên booster mecbûrî ne?

Na, lêbelê heke hûn mafdar bin û ji doza weya duyemîn 6 meh zêdetir dozek ber nebûya, hûn ê êdî bi derzîlêdanên xwe yê COVID-19 re nûve neyên hesibandin û dê dereng bimînin.

## Boosterê zêde ya zivistanê ya COVID-19 çi ye û kî divê yekê bistîne?

Hin kes ji COVID-19 bêtir di xetereya nexweşiya giran de ne. Ji bo parastina van mirovan berî zivistanê, dozek booster (duyemîn) tê pêşniyar kirin.

### Ji Nîsana 2022-an pê ve, hûn mafdar in ku vaksîna zivistanê ya COVID-19 (boosterê duyemîn) heke hûn:

- > 65 salî an mezintir
- > Aboriginal û xelkê cezîra Torres Strait 50 salî û mezintirin
- > niştecihek lênêrîna kal û pîr an sazgehek lênihêrîna seqetiyê
- > ji 16 salî û mezintir û bi giranî kêmasî parastinê heye. Ji bo mirovên di vê komê de, doza vaksîna zivistanê dê vaksîna COVID-19 ya pêncemîn be (sê dozên seretayî, yekem booster û boosterê zivistanê).

Hûn dikarin vaksîna xweya zivistanê ya booster a COVID-19 4 mehan piştî doza xweya yekem a booster, an jî 4 mehan piştî pêketin bi COVID-19 ya pejirandî heke we COVID-19 ji yekem doza weya booster pê ve hebe hûn dikarin vaksîna xweya booster a zivistanê bistînin.

Piraniya kesên ku mafdar in ji bo vaksîna booster a zivistanê ya COVID-19 jî mafdar in ku vaksîna bêpere ya sermayê bigirin.

## Ma ewle ye ku di heman demê de vaksîna COVID-19 û vaksîna sermayê hebe?

Hem vaksîna COVID-19 û hem jî vaksîna sermayê di heman demê de bi ewle û hêsan e. Ger hûn dixwazin her du vaksînan bi hev re bistînin biçin serdana doktorê xwe, dermanxane bikin.

## Hedîtinê (mewid) bibînin

Hevdîtin bo booster li hezaran cihan li seranserê NSW hene, di nav de dermanxane û GP yên.

Piraniya klînîkên Tenduristiyê yên NSW jî 'hatin' qebûl dikin, ku tê vê wateyê ku hûn ne hewce ne ku hevdîtin çê bikin.

- > Hevdîtin binînin an bi xwe biçin li [NSW Health vaccination clinic](#).
- > Li klînîkek, GP an dermanxaneyek nêzî xwe hevdîtinê bibînin li [clinic, GP or pharmacy near you](#).

Heger ji bo çêkirina hevdîtinê ji we re alîkarî lazim be, li ser **1800 020 080** telefonê Xeta Alîkariyê ya Neteweyî ya Coronavirus (National Coronavirus Helpline) bikin û ji bo xizmetên wergêranê vebijarka 8 lêxen.